

Bîranînek Taybet

Enehîte Mored

Hersal di -13-ê Gulanê de, ew bîranîna bi êş û jan, têkoşer û nemira Kurd Leyle Hesên Qasim bi bîra me tîne ku , ew keça ciwan weke xwendekareke dilsoz di buhara temenê xwe de , zordariya li ser gelê xwe yê Kurd nepjirandî .Wisên jî bi bîrûbawerî li rex birayê xwe mêr di nêv refên partiya demoqrat a Kurdistan de ,bi serkêşiya lehengê nemir û rêzdar Mistefa Berzanî weke endameke rola xwe bi jîrekî lîstiyê , nemaze çalakî û livên wê di kastîna zanîngeha Bexîdadê de berçav û balkêş dibûn . Û roj bi roj wê cihekî bêlikirî di nêv refên ciwanên xwendekar de digirt .Tevî di wê demê de an di salên heftê de, rewşa jina kurd bêtir li şûn û di tariyê de li ber xwe dida . Ji ber ku Leyla nemir nedikarî lêdan û cudahiya li ser jina Kurd bipejranda . Lewre jî , wê pêwîst didît ku , ji erk û stubariyên her Krudekî bi rûmet çî jin an mêr be yê herî pêşî ku li pêş dijmin û neyaran hejar û destgirêdayî nemînin. Girînge Kurd li dîrok , zîman û civaka xwe xwedî dekevin ta ku tarûmar û wînda nebin . Vêca jî, wê bi serbilindî weke endameke dilêr û jîrek kar û xebata xwe li dijî zordariya rêjîma El-beis kiriye, lê mixabin Leyla hêja li encamê, di sala -1974-an de di gel hevalên xwe tîye girtin û wan davêjin binê hepis û zîndanên Ebo-xirêb û bi hemû reng û şêweyên nemirovane wan didine ber darên îşkençê. Lê, Leyla pêdar tu carî serî li pêş zor û setemkariya bêbextên rêjîma şoven neditewand . Wisên jî di -13-ê Gulana -1974-an de bi destên wan qirêj û gemaran, di gel hevriyên wê ve tîne bi darvekirin û weke pakrewaneke Kurd di nêv rêzên karwan û şehîdên kurd de cî digirt . Ji berî darvekirina wê bi şahnazî, ew cilên kurdî li xwede û sirûda Ey reqîb bi degekî bilind gotiye û piştî wê dibêje, bijî Kurd û Kurdistan . Bêguman Leyla hêja û

delal îro em tev deyndarê wê ne, vêca jî wê cihekî bêlikirî di hiş , raman û dilê her Kurdekî birûmet de girtî û ew îro bûye sembola pêdarî û dilêriya jina Kurd .Lewre jî pir zar û zîç bi navê wê lehengê hatiye binavkirin , û xwezî bi canê kesên ku , zaro û ciwanên xwe li ser riya Leyle Qasim perwerde û mezin dikin . Bêguman ew mal û kes pirin , ev yeka nîşna xêrê ye, vîn û şiyrbûna gelê me Kurd diyar dike ku rojên li pêş ji rastî û dadimendî re ne

Newroz Geşa Buharê ye ...

- Cotyarê Cûmê-

Li Buhara rengîn hemo daxwaz bi hêvî dibin û demsalên evîne berepêş dibin , dil û cîger bi tinazî berve Newrozê derin , kulîlka avdarê bi rengê xwe ,nîşana avdarê dide. Avdara buha, bi her tuştên ku di bîr û baweriya gelê Kurd de qet wenda nabe. Her avdarê bi êş , jan û şahiyên wê tîne berçav , wêne , bîranîn û çîrokên zivîstana sar li siruştê Kurdistanê şêrîn awazên xwe belav dikin . Newroz geşa Buharê ye , ew bi xwîna pakrewanên Kurd ên canê xwe kirine qurban hatî avdan. Ewên bûne fenera ronîkirina riyên dijwar ji gelê xwe û ala azadî û aştîyê re, ta ku, herdem li ba û bilind bimîne . Hîn ew rondikên dilsoz ji çavên delalokên şehîdan ziwa nebûne ,û xemgîn mane . Ew nemir bûne hetav û nîşana xebatkarên Kurd, ku bibe hêzeke mezin di çavên neyarên mafê gelê Kurd de .

Li roja 20 an ji Avdarê , agirê Newrozê , tê pêketin , û li 21 an jî , gelê me siruştê delal hembêz dike , hemo bi jîndarî û bi hêrs, stiran , sema û awaza sirûda kurdî ,deng û destan Newroza xwe li dar dixînin .Bila Newroz bibe roja xurtkirina xebatê li dijî zagonên nijadperest û danesîna mafên gelê Kurd .

Newroz cejna netewî ya gelê Kurd e .